Stadt Wien

Newsletter

Destpêka xizmeteke agahîyê a pirzimanî

27.03.2020

Di qeyrana Coronayê da beşa Entegrasiyon û Pirrengîyê a bajarê Vienna ji **30ê Adarê 2020** xizmeteke agahdarîyê a pirzimanî pêşkêş dike.

Pirsên xwe di derbareyê qeyrana Coronayê de bi zimanê xwe yekemîn rêbikin. Em ji bo we lêbikolin, ka ji çavkanîyên pêbawer bersivên pirsên we hene û em ji we re bi agahdarîyên bi zimanê we yekemin pêwendîyê kevin.

Hûn dikarin weha pirsên xweji me re rêbikin

E-Mail: post@ma17.wien.gv.at

- Facebook: startwien.at
- Telefon: 01 4000 81540 (Ji me re telefon bikin û bêjin hûn dixwazin bi kijan zimanî pirsên xwe bikin. Yek ji karmendên me ji we re paşve telefon bike.

Em kijan zimanan diiaxivin

Hûn dikarin pirsên xwe bi zimanên jêrin rêbikin: Shqip / عربي / Български / Bosanski / Hrvatski / Srpski / English / فارس / Français / Kurdî / Маркедонски / پښتو / Polski / ਪੰਜਾਬੀ / Română / Русский / Slovenčina / Español / čeština / нохчийн маттахь / Türkçe / Magyar

Çi wext hûn dikarin xwe bigihînin me

Duşem heta Înê ji demjimêr 9 heta 16. Em bitêkoşin, pirsên we di mabeyna 24 demjimêran de bibersivînin.

Em nikarin hertişti bibersivînin

Karmendên beşa Entegrasiyon û Pirrengîyê a bajarê Vienna ne pisporên Coronayê ne. Lê em bitêkoşin, we bi agahdarîyên ji çavkanîyên pêbawer bi zimanê we yekêmîn haydar bikin. Heger agahdarîyên ji çavkanîyên pêbawer ji bo pirsên we nebin, mixabin em nikarin wan bibersivînin û tikayî feraseta we dikin.

Impressum